Jin di kulturê kurdan de. !.

Marûf M. Elî

Dibe ku ev babet ne gelek asan be ku mirov di gotarek weha de li ser binivîse û pêwîstî bi lêvekolînek dûr û dirêj heye. Hêviya me ewe ku em di demên pêş de bikarin bi vî erkî rabin..!

Piştî kuştina ***Dua*** yê bi wî şêwê hov û dirindane, ku mejiyê mirovatiyê hejandî, gelek hizir û pirsên metirsîdar di mejiyê mirovî de ser hildidin. Gelo ew çi eger in, çi hizr in, çi bîrûbawer in, çi kultur e, mirovî bigehîne wê astê ku ji hemû bihayên mirovatiyê rût û vala bike û mîna giyanewerekê dirinde reftarê bike?!

Helbet kujtina jinan di civakê kurd de ne tiştek nû ye, belku jinkujtin bûye yek ji sîmayên here berçav yên civakê me û ev kiryara neciwan gehiştiye wê radê ku navê kurdan di lîsteyê rêkxistinên cîhanî yên mafê mirovan de li pêş be! gelo çima?

Miletek wisa hov û dirinde li hember jinê, erê ew ji hejî jiyanêye gelo? Miletek li dijî hezkirinê(viyanê) be, ku hezkirin bihatirîn sêmbola mirovatiyê ye. Erê mirov ji bo miletek wisa dikare çi bibêje? Her kesê ji stiranên gelerî yên kurdan guhdarî bike, wê bizane ka viyan û hezkirin li cem

kurdan çi karek fihêt û şermizarî bû û piraniya şer û mêraniyên kurdan her li pênavê vê çendê bûne, gelo çima? Ev pirsyare û bi sedan pirsên din ez bi giring dizanim ku her kurdek ku bawerî bi azadiyê û bihayên mirovatiyê hebe, li bersiva wan xwedî derkeve!

Ez niha li ewropa dijîm û gelek caran li gel hindek biraderên kurd, dema em dîmenên kur û keçan bi hev re dibînin ku gelek bi kêf û şad in, ez dipirsim erê çima wisa be, eve jî mirov in û em jî mirov in û mirov jî, li kû dera dunyayê be, hez û xwastekên wî yek in. Evca çima li cem van azadî hebe û tu cudawazî di navbera keç û kuran de nebe û her dû regez bi hev re bi jiyanê û xweşiyên jiyanê pir kêf û şad in.Û li welatê me jî keç û kur bi derdê negehiştina hev dinalin û tûşî çendîn nexweşiyên derûnî dibin, yan jî şewitandin, kujtin û berdebarankirin dibe, berhemê hezkirin û peywendiya wan!? Lê wek her car bersiva van hevalan ewe ku dibêjin em kurd in û em ne ewropî ne, kulturê me û dabûnêrîtên me(tiradisyon) rêkê nadin ji bo me? Helbet ez jî mîna her car ji wan re dibêjim erê ma heta kengî dê bi wan tiradisyonan ve girêdayibin û ma dem nehatiye ku em jî mîna van ewropiyan pêdaçûnekê di kultur û tiradisyonên xwe de bikin?!

Jiyan ji dû regezan pêk dihê, jin û mêr, ne jin bêyî mêr dikare bijî û ne jî mêr dikare bêyî jin. Evca çima mêr wisa jinan bê biha dikin û bi çavek pir bi guman û kêm lê temaşe dikin? Dê çawa emê bikarin civakek yeksan û saxlem ava bikin, heger nêrîna me ji bo jinê wisa xirab û pir bi guman be?

Helbet dîroka hevrikî û

neyeksaniya di navbera jin û mêran de, di kurahiya dîrokê de dest pê dike mêran bi hêza masolkên xwe jin xistin jêrdesthelata xwe û bi sermayê xwe yê taybet zanî û bi şêweyek gelek dijwar û hov reftar li gel kir.! Ev dîrok her didome ta serdemên derkeftina ayînan, ji ber ku dîn jî her berhemê mejiyê mêran bû, lewma jî parsengî û piştevanî her ji mêran dikir û bi çavek gelek nizim û bi guman li jinan temaşe dikir û pirsgirêka jinê qet çare nekir û bi têkelbûna bîrûbawer û adetên civakî yên kevnar li gel yasa û pirensîbên ayînî, ev pirsgirêk pitir girê û aloz kir û êdî jin tenê bû sêmbola namusa mêran!?.

Bi dîtina min, ji bo vekirina vê girêya aloz û çareserkirina vê zordariya li hember jinê dihê kirin, bi tenê yek rê li ber me ye, ku ew jî, em pêdivî bi şoreşek kulturî ne, ev şoreşe jî pêwîste di mejiyê me de dest pê bike. Ango gereke em bingeha xwe ya hizirî û kulturî bi yekcarî biguherin û em bikarin ji nû ve bingehek kulturî û hizrî ava bikin ku rêzê li morvan û bihayên mirovatiyê bigre, ne ku rêzê li hindek yasa û pirensîbên kevneşop bigre. Heger em amade nebin ji bo vê şoreşê, bi rastî gelek zehmete em bi tenê gotinan ve bikarin civakek modêrn û pêşkeftî ava bikin.!.